ÇÎROKÊN KLASÎK ÊN ZAROKAN

SÊ BERAZÊN BIÇÛK

Hebû carek ji caran, xêr û xweşî bibarin li hazir û guhdaran...

Hebû tunebû, dibêjin li nav daristanekê sê berazên biçûk hebûn. Ev sê beraz, birayên hev bûn. Birayê biçûk, birayê navîn û birayê mezin, her sê bira beraz, li cem dayika xwe bi kêfxweşî dijiyan.

Rojekê dayik-beraz gazî her sê kurê xwe kir û ji wan re got:

--Delalên min, êdî qeweta min tune ez we xwedî bikim. Divê hûn ji vir herin û bila her yek ji xwe re mala xwe çêke. Lê divê hûn mala xwe pir saxlem çêkin, ji bo ku gurê mezin û dilreş nikaribe bikeve mala we û we bixwe.

Piştre dayik-beraz her sê berazên biçûk hembêz kirin û bi hêstirên çavan ew ji malê şandin.

Sê beraz ji malê derketin û çûn.

Berazê biçûk, yê ku birayê herî biçûk bû, di rê de rastî mirovekî hat. Wî mirovî bi ereboka xwe pûş û pelaş dibir cihekî. Berazê biçûk jê pirsî got:

--Ji kerema xwe hûn dikarin piçek pûş bidin min ji bo mala xwe çêkim?

Û wî mirovî hinek pûş da wî.

Yekemîn berazê biçûk rahişt wan pûş û pelaşan û çû bi wan mala xwe çêkir.

Duyemîn berazê biçûk jî çû, rastî mirovekî din hat. Wî mirovî jî bi ereboka xwe darik dibirin cihekî. Berazê biçûk jê re got:

--Ji kerema xwe hûn dikarin piçek darik bidin min ji bo mala xwe çêkim?

Û wî mirovî jî hinek darik da wî.

Ew beraz, yanî birayê navîn, rahişt wan darikan, çû mala xwe çêkir.

Sêyemîn berazê biçûk jî, ku birayê herî mezin bû, çû rastî mirovekî din hat. Bi wî mirovî re jî pîrket hebûn. Berazê biçûk jê re got:

--Ji kerema xwe hûn dikarin hinek pîrket bidin min ji bo mala xwe çêkim?

Û wî mirovî jî hinek pîrket da wî.

Û ew beraz, yanî birayê mezin, bi wan pîrketan çû ji xwe re maleke saxlem û mezin çêkir.

Lê wê êvarê dema ku sê berazên biçûk bi kêf vedigeriyan mala xwe, gurê mezin û dilreş ew dîtin. Gurê dilreş di dilê xwe de got: “Himm! Goştê wan niha çiqas teze ye! Gelo ez pêşî kîjanî bixwim ? Herî baş ew e, ez herim wî berazê biçûk ê ku mala xwe ji pûş û pelaşan çêkiriye, bixwim.”

Û gurê dilreş çû li deriyê yekemîn berazê biçûk da û got:

--Berazê delal, ka derî veke ez bikevim hundir! Ku tu venekî, ezê pif bikim û mala te hilweşînim.

Berazê biçûk got:

--Na, ez venakim.

Gurê mezin heta ku jê hat pif kir, mala ji pûş hilweşiya.

--Hewar, hewar! got yekemîn berazê biçûk û bazda çû mala birayê xwe yê navîn.

Gurê dilreş jî çû li deriyê duyemîn berazê biçûk da, ku wî berazî jî mala xwe ji darikan çêkiribû. Gur got:

--Berazên delal, ka derî vekin ez bikevim hundir! Ku hûn venekin, ezê wisa pif bikim ku mala we wê bi temamî hilweşe.

Duyemîn berazê biçûk got:

--Na, ez venakim.

Îca gurê mezin û dilreş heta ku jê hat pif kir, mala ji darikan çêbûyî bi carekê hilweşiya û herdu bira beraz beziyan çûn mala birayê xwe yê ku wî mala xwe ji pîrketan çêkiribû.

Sêyemîn berazê biçûk ji birayên xwe re got:

--Qet netirsin, gur nikare tiştekî li vê malê bike.

Dîsa dengê gur hat got:

--Berazên delal, ka derî vekin ez bikevim hundir! Ku hûn venekin, ezê pif bikim û mala we ji binî ve hilweşînim.

Sêyemîn berazê biçûk got:

--Na, ez venakim. Tu çi dikî bike.

Îca gurê mezin ji carên din zêdetir hêz da xwe û wekî dînan pif kir, lê vê carê wî nekarî malê xera bike.

Gurê dilreş pir aciz bû û biryar da ku here xwe ji kulekê berde nava malê. Lê di vê navberê de sêyemîn berazê biçûk, ku pir bi aqil û qurnaz bû, çû di tifikê de agirekî xurt dada û qazanek av danî ser agir. Dema gur xwe ji kulekê berda xwarê rasterast çû ket nav ava keliyayî. Îca gurê dilreş wisa qiriya wisa qiriya ku ji derveyî gund jî dengê wî dihat bihîstin. Wî xwe çawa ji kulekê berdabû jêr, eynî bi wî awayî ji kulekê hilkişiya jor û reverev ji wê derê dûr ket. Û gurê mezin careke din newêrî were nêzî mala wî berazî.

Çîroka me qediya,

xêr û xweşî li hazir û guhdaran bariya.